

Welat

01/03/2019

Çandî - Giştî - Serhîwe

60

NIVÎSANDIN BI KURDÎ ERKEKÎ NETEWÊYÎ YE

Tablo: Hunermend
Kamîran Şemdîn




Welat

PEYVA WELAT

Nivîsandin bi zimanê kurdî
erkekî neteweyî ye

Desteya sernivîs

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- MehaneSernivîser:
Aras YûsivDesteya rêvebir:
Imran YûsivDizayner:
Hesen Berzencî

Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpîrsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Ji bo hebûna her gelekî yan miletekî, ziman mercekî sereke û bingeîn e, kes nikare vê rastiye piştguh bike yan jî di ser re çembike.

Zimanê kurdî yek ji zimanên herî kevn û dêrîn e, lê mixabin bi dehên salan ew rastî çewisandinê hatiye. Ji bo qirkirina çanda kurdî û sojandina netewî dagîrkerên kurdistanê bi tundî şerê zimanê kurdî kirin û xwestin wî bi carekê re ji holê rakin. Li bakurê kurdistanê di demekê de axaftina bi zimanê kurdî tawaneke mezin bû, û sizaya wê digihte bidarvekirinê, herwiha li rojavayê kurdistanê û Sûriyê axaftina bi zimanê kurdî li saziyên dewletê hatibû qedexekirin û heger pirtûkek bi zimanê kurdî bi kesekê re hatiba girtin ew yekser tavêtin zindanê û ew êşkence dikirin. Di heman dema ku şerê çand û zimanê kurdî dikirin, dagîrkeran çand û zimanên xwe li ser gelê kurd feriz dikirin. Vê siyaseta şofînîst û nijadperest ya ku bi dehê salan dirêjkiriye ziyaneke mezin gihande ziman û çanda kurdî.

Îro roj derfet hatiye ku zimanê kurdî ji nû ve rabe ser pêyan, lê mixabin xemsarî ji alî nivîskarên kurd ve heye, piraniya wan bi zimanê netewa serdest dinivîsin û xwedî li zimanê xwe dernakevin, û gelek ji wan jî zimanê netewa serdest di ser zimanê xwe

re dibînin, nivîskarên ku bi zimanê kurdî dinivîsin jî pir hindik in .

Ev pirsgrêkeke mezin e, çiku heger ziman nekeve warê nivîsandinê ticar li pêşnakeve. Hin nivîskar didin ber riwê xwe û dibêjin ku zimanê kurdî têra derberîna nivîskî nake û şîyan û imkanên wî lawaz in. Ev ne rast e, zimanê kurdî zimanekî dewlemend e û gencîneyeke zengîne bi peyv û hevwateran , tenê ji nivîskaran tê xwestin ku toza piştguhkirin û qedexeyê ji ser hilînin.

Ziman, çi ziman be, ger di nivîsandinê de neyê bi kar anîn, roj bi roj dê lawaz û wenda bibe, ji lewre nivîsandina bi zimanê kurdî berî her tiştî erkekî neteweyî ye, û rabûna bi vî erkî stûbariya nivîskarên kurd e. ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution



PÊWÎSTIYA PÊŞGOTINÊ JI BO PIRTÛKÊ ÇI YE ?

Luqman Abdulrehman

Di van çend salên dawîyê de, gellek pirtûk hatine çapkirin, bi mijar û naverokên xwe cûbicûr in, (helbest, çîrok, roman û lêkolîn) in.

Di destpêka piraniya van pirtûkan de pêşgotin heye, lewre di vê gotarê de emê balê bixşînin ser pêwistî û giringiya pêşgotinê ji bo pirtûkê, herwiha ji bo nivîskar û xwêner jî.

Di derbarê vê mijara bi girêk de gellek pirs xwe didin pêş;

Gelo ! pêşgotin nirxekî zêde dide pirtûkê ? An, ew bûye diyardeyek û awayek ji awayên lûsekirinê ku di nav nivîskarên me de belav bûye ?

Gelo ! pêşgotin ji bo pesindayîna nivîserê pirtûkê û nivîsa wî ye ? an jî rêbazek ji rêbazên amadekirina pirtûkê bi xwe ye ? Divê kî pêşgotinê binivîse û ji kê re tê nivîsandin ?

herwiha gelek pirsên bi vî rengî yên bala xwêner , rewşenbîr û rexnevanan dikşînin .

Bi gelmperî û zelalî , em dikarin bibêjin ku erka pêşgotinê ewe ku nivîser bi xwêner bide nasîn û naveroka pirtûkê bi kurtayî ji xwêner re pêşkêş bike, ne kêr û ne zêde. Lêbelê nabe ku pêşgotin bê bikaranîn ji bo pesindayîna nivîser yan dilxweşkirina wî (bi taybetî ew nivîserê ku hîn di qada

nivîsandinê de ne xuyanî ye), nabe jî ku di nirxandina nivîsa wî de zêderewî hebe, çiku dibe ku ev pêşgotin bibe awayek ji awayên xapandina xwêner. Lewre pir giring e ku pêşgotin li ser bingehekî zanistî û wêjeyî yî rast û durist bête nivîsîn. Li gorî ku hatiye naskirin û bikaranîn, sê cûreyên sereke ji pêşgotinan re hene, ew jî evin :

1 – Pêşgotina ku rexnevan ji nivîser re dinivîse ; wek me berê anî ziman, di vê pêşgotinê de rexnevan karê nivîser dinirxîne û dîtina xwe di wî karî de dide şirovekirin.

2 – Pêşgotina ku nivîser bi xwêner dide nasîn; wekî kurtejiyanekê tê nivîsîn.

3 - Pêşgotina ku nivîser bi xwe dinivîse; bi giştî di destpêka pirtûkên lêkolînan de tê bikaranîn, di vê pêşgotinê de lêkolîner mebesta lêkolîna xwe, rêbazên ku bikaranîne, mijar û beşên wê ji xwêner re diyar dike wekî mînak; pirtûka nivîskar (Ebdulmecîd Qasim) ya bi navê / wêjeya zarokan di çanda kurdî de /.

Ji bilî van hersê cûreyên sereke yên ku me anîn ziman, pêşgotinek heye nivîserek kevin û navdar ji nivîserekî nenas û nûhatî re datîne, di vê pêşgotinê de diyar dibe ku ew nivîserê nûhatî şagirtê nivîserê navdar e, bi vî awayî pirtûk bêtir belav dibe û pêşgotin dibe mîna propaganda ji pirtokê re , wekî mînak; pirtûka çîroknivîsa Mesrî Beraa Elxetîb ya bi navê / ew ji dawî de tên / ku nivîskarê mezin Heyder Heyder jê re li ser bergeya pirtûka wê nivîsiye, vê yekê hişt ku ev pirtûk zû belav bibe û bi piranî bête firotin. Her wiha di pirtûkên kurdî de jî ev

yek heye, nivîskar û siyasetmedarê bi nav
û deng / Osman Sebrî / pêşgotin ji pirtûka
helbestvanê nemir Seydayê Cegerxwîn re
daniye , û hinin din jî jê re nivîsandine lê
ew ne wêjevan bûn, dibe ku sedem di wê
demê de kêmpêydabûna nivîskarên kurd
bûye, bi taybetî yên ku bi zimanê kurdî
dinivîsandin .

Lê di salên heştêyî de ev reng ji pêşgotinê
di nav nivîskarên cîhanê de kêmbû, û
gotinek derkete holê dibêje / bila pirtûk bi
xwe xwe bide pêşkêşkirin), di vî warî de
helbestvan û nivîskar Salihê Heydo dibêje;
pêşgotin ji bo pirtûka helbestê ne gerek
e, bila xwêner wan helbestan bi serbestî
bixwîne û dîtina xwe bide, ewê bibêje ev
pirtûk hêjayî xwendinê ye yan na .

Bila helbestên helbestvan û berhemê
nivîskar wî bi xwêner bide nasîn, wiha em
dûrî pesindariyê û dilxwaziyê dikevin .

Nîvîşka gotara me ewe ku nabe her

kes pêşgotina pirtûkê binivîse,
û pêşgotin ne ji her pirtûkê re jî
tê nivîsîn, divê ew pirtûk hêjayî
xwendinê be.

Ji bo pirtûkên ku taybet bi zarokan e
pêşgotin ne gerek e.

Dibe ku nivîskarekî mezin û navdar ji
yekî nûhatî re pêşgotinekê binivîse,
lê divê ew pirtûk hêjayî be. ■





RÊYA XWEHR

Şivan Reşik

Î sal rewşa çandiniyê pir baş e, zad têr baran bûye, lê hîn jî tirs ji zîpikan heye, dibêjin li deverinan zîpekê li zad xistiye, lewre min got ezê serîkî bidim zadê xwe da ku dilê xwe têxim cih.

Min tirimbêlek girt û bi alî gund ve em bi rê ketin, qederekî baş em bi rêve meşyan, ji nişkê ve ajoker rêya sereke ya qîrkiş berda û da ser rêyeke ax.

Ev cara pêşî ye ku ez vê rêyê dibînim, berî 5 heyvan hatim gund, ev rê tinebû, ev yek bi min nexweş hat ji ber ku ew rê di nav zadê xelkê re derbas dibe.

Di cê cih de min berê xwe bi ajoker vekir û min jê pirsî :

-Keko, bo çî te rêya sereke berda û te da ser vê rêya ax ?

Bi girnîjîneke nerm li min veherand :

-Li vir gelek kort û konçal di rêya sereke de hene, ev rêya ax ji bo tirimbêlê xweştir û çêtir e.

-Eha, lê ev rê di nav zadê xelkê de ye, ma wisa dibe keko ? (min gotê)

Ajoker kenîya û got :

-Ka zad ! Wekî tu dibînî. zad nemaye û rê bûye ax.

Matmayî min got ;

-Berî 5 mehan, ez di vir re derbasbûm, ev rê tinebû.

Bi xemsarî li min veherand :

-Nizanim ...belkî.

Piştî kêliyeke kurt ji pûnîjînê, min berê xwe bi ajoker vekir û derî ji axaftineke dirêj re pê re vekir .

-Ev zad, ne ji ber zîpikan lê ji ber pêlîkirina tirimbêlan miriye, Gelo ev gunehê kê ye ?

-Tekez, ne gunehê min e, wekî tu dibînî rê bûye ax.

-Heger xwedîyê vî zadî bixwaze gilî bike, ewê li kê gilî bike û kî dê sûcdar be ?

Kêlîkê ramiya û got :

-Bêguman ewê ku cara pêşî bi tirimbêla xwe

pêlêkiriye ew berpîrs e.

- Ew jî dikare wek te behaneyekê ji xwe re peyda bike.

- Hîç behaneyek jê re nîne. Helbet ew berpîrs e.

- Ew dikare bêje ku ew carekê tenê di ser re derbas bûye, û bi carekê tenê zad namire.

- Naxwe ê cara duwem pêlêkiriye ew berpîrs e.

- Behana wî jî amade ye. Zad berê hatiye dewisandin. Carek û du car wekhev in. Jixwe cara duwem jî zad nakuje.

- Dêmek ê cara sêyem sûcdar e.

- Dibe ku bi sê car pêlêkirin jî zad nemirbe.

- ji ê cara çaran pêve nema, tekez ew ê sûcdar e.

-Tu nikarî tekez bikî, pîrs ewe gelo zincîreya berpîrsandê li cem kê radiweste ?

- Li cem ew kesê ku derba mirinê li zad xistiye.

- Gelo tu dikarî binasî piştî çend car pêlêkirin dê mirin bê.

- Na, nikarim.

-Guhdar be keko, gava ev zad zindî bû, mirovekî bê berpîrsî xwe lêxist.vî tawana herî mezin kir. Paşê yekî din hat, ku tawana wî hinekî ji vî yê yekem kêmtir bû, cara duwem pêlêkir. Dûv re, ê sêyem hat, ku şaştiya wî hebe jî ji yê duwem kêmtir bû, cara sêyem ev zad dewisand. Ê yek li du yekî , mirovên neberpîrs, ew zad qîrkiş û tinekir. paşê dora ên wek te hat, ew kesên ku di civakê de ne wek mirovine pîs tên hesibandin. Evan jî ketin heman rêya şaş ya ku bi gavên pîsan hatibû vekirin.

Di vê proseya rêguhertînê de, hevdem ên vê bûyerê rêya dirust û ya şaş nasdikin. Lê dîsa jî xwe berdidin rêya şaş.

Nîfşê ku li dû van dê bê, rêya dirust ji bîr dike ,tenê ya şaş nas dike, dizane şaş e. belam serê xwe bi çîrokê mijûl nake.

Çend nîfşên din dê werin, ew rêya şaş ji wan re dibe rêya herî dirust, ku qet nakeve bala wan rêya dirust a kevn a bi toza dem û dewranan hat veşartin. Ê heger zanayek an bîrmendek ji nav wan derkeve û bixwaze wan veherîne rêya dirust, bi çavê gumanê lê dinêrin, ramana wî napejirînin, û li hember fikirê wî disekin.

Piştî wê axavtina dirêj, ajokar bêdeng ma û bersiv jê derneket.

Dema karên xwe li gundî bi dawî kirin, di heman rêyê re veheriyan. Gavagihîştin ew cihê kortal û koncalan, ajoker bê hemdî xwe dikir dakeve rêya li kêlekê. Lê ji nişkê ve pê li firêmkir , berê dolaban guhert, û xwe li koncalan qeliband. ■



Imran Yûsiv

ŞANO... NERÎNEKE DÎROKÎ

Şano çi ye ?

Dibe ku her mirovek li gorî têgihiştina xwe Şano bide nasîn, dibe jî ku hemû pênase rast bin çiku mirov nikare hunerekî gewre weke şano bi hevokê bide nasîn.

Şano ew hunera efsûndar e, a ku hemû huneran li xwe digire, û di hembêza wê de hemû huner digihêjin hev, di heman demê de taybetmendiyeke xwe heye ku ew hunera DRAMA ye ango li ser kirinê ava dibe çiku peyva DRAMA peyveke Yûnanî ye tê wateya (Ez dikim)

Çawa hunera Şano derkete holê ?

Hunera pêşîn ku mirov ew naskirîye û bi kar anîye reqs û sema bûye, mirovê destpêkî bi wan reqs û semayan xwe nêzî xwedwendan dikir, û hêlçûna xwe vala dikir, herwiha sema ji bo mirov awayek derberînê bûye .

Em nizanin kengî û li ku derê mirov dest bi semayê kirîye, dibe ku li hezarên deveran be û li her cihê ku mirov lê jiyaye be.

Hêdî hêdî semayê nêzîkahî li şano kir, dema ku mirov kirin (Drama) derbasî reqs û semayên xwe kir, wekî mînak (reqsa nêçîrê- reqsa baranê- reqsa cengê) û gelek reqsên din ku heya niha li cem gelek êl û gelan peyda dibin .

Şano yekser ji wan reqs û dîlanên destpêkî hatiye , û hin bi hin reng û şeweya xwe ya taybet û cuda standîye, ango şano di koka xwe de keça reqs û semayê ye.

-Şanoya Grîk :

Şano cara pêşîn li nik gelê yûnanistanê peyda bûye di sedsaliya şeşan berî zayînê de, û pirtûka-

Aristo-(Hunera helbestê) yekemîn pirtûk di warê rexne, rêgeh û rêbazên hunera şanoyê de hatiye danîn, nemaze ya ku bi rengê helbestî hatiye nivîsîn.

Du cûreyên sereke di şanoya Grîkî de derketin, ew jî (Trajîdya û Komîdya) bûn.

Aristo dibêje :

“Şanoya trajîdîkî hunera (dîthramb) ya ku di fîstîvalên diyonosî de bi rengê helbest û stran dihate gotin çêbûye.”

Efsaneya Yûnanî dibêje ku (Thîsbîs) Lîstikvanê pêşîn bûye yê ku rolek sereke di çîroka dîtrampî de dilîst , her ku monolocek straba kewres lê vedigerand.

Di sedsaliya pêncan berî zayînê de şanoya yûnanî gihişte asteke bilind, di vê demê de bêtirî hezar deqên şanoyê hatin danîn, lê mixabin tenê sîh û yek ji wan man û gihiştin nav destên me.

Nivîskarên şanoyê yê bi nav û deng (Esxîlos-Sofoklîs-Yorbîdis) bûn, tiştên hevbeş di navbera şanoyên trajîdîk yê Grîkan de ew bûn ku tev li ser bingeheke helbestî hatibûn avakirin, her weha axaftin û hevpeyvîn di navbera kesatiyên şanoyê de bi dorê dihatin belavkirin (bêtirî sê kesan bûn), ji alî xwe ve kewres sirûd dûbare dikir, çîrok û mijarên wan tev ji efsane û dastanên kevnare û dîroka gel bûn.

Şanoyên trajîdîk di ahengên Diyonosî de dihatin pêşkêşkirin û di pêşbirkeke şanoyî de sê şano bo pêşkêşkirinê dihatin helbijartin, ji mercên pêşbirkê divabû mijara şanoyê rexnekirina xwedawendan be.

Di orta sedsaliya pêncan berî zayînê de komîdya jî pêşketineke mezin jiyankir , Aristovanos yek ji

SCHOLASTIC

History of theatre




1000bc-146bc: Ancient Greek theatre

The Ancient Greeks created purpose-built theatres called amphitheatres. Greek amphitheatres were usually cut into a hillside, with tiered seating surrounding the stage in a semi-circle, like the Theatre at Epidaurus pictured above. Most plays in ancient Greece were based on myths and legends, and often involved a 'chorus' who commented on the action. The works of famous Greek playwrights, such as Sophocles, Aristophanes and Euripides, are still performed today.




753BC-AD476: Ancient Roman theatre

The Romans continued the Greek theatrical tradition. Their theatres resembled Greek amphitheatres but were built on their own foundations and often enclosed on all sides. The Colosseum in Rome (pictured), which was built between AD72 and AD80, is an example of a traditional Roman theatre. Theatrical events were huge spectacles and could involve acrobatics, dancing, fighting or a person or animal being killed on stage. Roman actors wore specific costumes to represent different types of familiar characters.




900-1500s: Medieval theatre

After the Romans left Britain, theatre all but died out. It was reintroduced during the 10th century in the form of religious dramas, plays with morals and 'mystery' plays performed in churches, and later outdoors. At a time when church services were conducted in Latin, plays were designed to teach Christian stories and messages to people who could not read.



1500s: Commedia dell'Arte (Italy)

This form of Italian theatre became popular in the 16th and 17th centuries. Props and costumes were basic and the plays were performed - free for all - on raised platforms in public piazzas (squares). Plots generally centred around the struggle of young lovers, whose union was being hindered by an elder. These plays made use of a set of similar characters that all had different characteristics. This type of play also found its way into both French and English theatre.



1558-1603: Elizabethan theatre

Theatre during the reign of Elizabeth I has largely become linked with one name - William Shakespeare, arguably the most influential and famous dramatist of all time. During Elizabethan times, plays were staged in special wooden playhouses. The Globe Theatre (pictured), on the banks of the River Thames in London, is a prime example. The majority of the audience would have stood in the 'pit' in front of the stage, while richer audience members sat on seats around the edge.

komîdîvanên herî bi nav û deng di wê qûnaxê de bûye, bi şano ya xwe ya hêja (beq), vê komîdyayê kesatyên giştî rexne dikir .

Di sedsaliya çaran berî boneya Mesîh de, komîdya cihê tracîdya girt.

Bi rêya rewşenbîriya Hilinistî û Iskenderê mezin şano ya yûnanî li cîhanê belavbûye.

Eger em li avahiya şanogeha Grîkî binerîn em dibînin ku hemû şano li ber ba pêşkêş dibûn, asomanê şanoyê grover e, hawîrdorê ji binî ta jor rûniştokên rengê pêpelûkan bûne, li ser girekî, bi şeweyekî nîvgrover bûye, têra ji (15000 heya 20000) bîner dikir, bê pere derbasî şanogehê dibûn, çimkî şano wek dezgeheke giştî ya dewletê yan bajêr bûye û ew alavek ji bo perwerdekirî, hişyarkirî û pakkirîna sincî û giyanî bûye.

Hemû lîstikvanên şanoyê li cem gelê yûnanistanê cihê rêzgirtinê bûn.

Şano ya Romanî:

Di babelîska sêyan berî boneya Mesîh de, şano ya Romanî pêşket, ev şano girêdayî ahengên olî yê ku bi piranî dihatin li dar xistin bûye, û rolek xemrevînî û serşahî jî dilîst.

Komîdya wek şanoyeke gelêrî li

Romaya Kevnar hatibû naskirin , ew ji destpêka babelîska duyan berî boneya Mesîh ve li ser destê (Blotos û Tîrîns) pêşket.

Bandora komîdya Grîkî pir li şano ya Romanî hebûye.

Ji tiracîdyayên ku têne naskirin li cem Romaniyan, di sedsaliya yekemîn berî zayînê de şanoyên (sînîk) bûne, û şanoyên (salon) yê li ser şopa şano ya Grîkî dimeşyan.

Piştî ketina şaneşahiya Romanî û peydabûna femandariya dêrê (Xiristanî) şano ya klasîk ya Romanî û Grîkî di çanda rojava de li ser dirêjahiya pênc babelîskan nevedî bûye.

Şano ya klasîk ya nû

Di serdema hişyarbûnê de li Ewropayê, û piştî şoreşa olî ya prostantî bi serokaitiya (Martin Lother) ji nû ve şano vejînî û ji şeweya xwe ya olî ya pîroz derket û derbasî şeweyek jiyanî bûye, wisa şanoger vejeriyan şano ya Yûnanî ,û berê wê dane asoyên nû û fireh, bi demê re gelek rêgeh û dibistanin şanogerî peyda bûn wekî mînak (Romantîkî - Soryalî-Dadayî...û gelek din)

Cardin şanoyê di çanda gelên rojava de cihê xwe girt wek hunerike giranbûha û serbixwe û bi demê re di gelek guhertinan re derbasbûye.

Şano ewe hunera ku xwedî razeyên pîroz e, rola wê ne tenê ramyarî ye ku dikare bîrweriyê di nav civakê de biweşîne, lêbelê di heman demê de jî dikare giyanê mirov pak û ronî bike. ■



REŞÎDÊ KURD... JIYAN Û BERHEM

“Pir kar û barên min hene ku ez bikim, min ew hêj nebirine serî. Na gerek ez niha nemirim. Gerek ez vegerim baxçeyên Dêrîkê, ku min ji mêj ve bêriya wan kiriye, paşê bila mirin were”

Reşîdê Kurd

Tekoşer, nivîser, ronakbîr û rewşenbîrê payebilind Reşîdê Kurd, navê wî Reşîd kurê Mihemedê Reşo ye, Di sala 1910an de, li gundê “Roşatê” yê bi ser Dêrika Çiyayê Mazî ve, li Bakurê Kurdistanê ji dayik dibe.

Qonaxa xwendina seretayî li gund, ya navendî li Mêrdînê dixwîne û bi pileyeke bilind bawemameyê bi dest dixe.

Ji ber asta wî ya berz û li pêş di xwendinê de, di amojgeha mala mamosteyan de li Qonyayê tê qebûlkin.

Di wê demê de bûyerin pir mezin û dîrokî diqewimin, wekî (rûxandina dewleta Osmanî, şoreşa 17 oktoberê li Rûsyayê û avabûna Yekîtiya Sovyêt, peymana Sîver û Lozanê, şoreşa Şêx Se'îd û şoreşa Araratê û gellek bûyerin din) ku bandora xwe bi xurtî li rewşa gelê kurd li bakurê Kurdistanê kirin.

Reşîdê Kurd, wekî ciwanekî bîrwer û xwendekarekî jîrek bi van bûyeran bandor dibe, û dest bi tekoşinê di ber doza gelê xwe yî bindest û mirovahiyê de dike, û li dijî faşîzma tirk û kemalîzmê radibe.

Ji ber çalakkûna wî li mala mamosteyan, ji alî hêzên ewlehiya desthilatdariya kemalîzmê tê girtin û zindankirin, piştî demekê ji zindanê direve û ji ber çavên desthilatdariya kemalî xwe dide alî, lê ew ji dû wî venagerin û didin pey şopa wî heya ku careke din wî digrin û diavêjin zindanê, vê carê fermana bi dar

vekirina wî derdixînin. Ji ber ku malbata Reşîd zengîn bûn û li deverê xwedî bandor bûn, dikarîbûn pereyan bidin hin berpirsên Tirk û Reşîd ji zindanê bidin revandin.

Piştî lêbirrîna hukmê bi dar vekirinê û reva ji zindanê ew neçardibe berê xwe bide rojavayê Kurdistanê.

Di sala 1940 de Reşîdê Kurd digel Qedrî Can dadikeve rojavayê Kurdistanê û li gundê Talikê yê bi ser bajarokê Derbêsiyê ve bi cih dibe, di kovara Hawar, Ronahî û Riya Taza de gellek helbest, û çîrokan belav dike.

Lêbelê ewî du tiştên giranbuha li dû xwe hiştibûn, ew jî hevjiha wî Xatûn û pirtûka wî Rêzmanana zimanê kurdî bûne, ji lewre di sala 1946an de bi dizî derbasî bakurê Kurdistanê dibe, dema digihêje gundê xwe, pirtûka xwe ya (Rêzimanê Kurdî) dide hevjiha xwe û jê re dibêje; (Xatûn vê pirtûkê bigihîne Sûriyê, eger tu gihiştî

gundê Talikê digel vê pirtûkê wê hingê tu min ji mirinê rizgar dikî.)

Reşîdê Kurd li bajarê Amûdê bi cih dibe - ku ew ji bo hemû tekoşerên kurd navenda çalakîyên siyasî û rewşenbîrî bûye- û di warê siyaset û çandê de kar dike.

Xebat û tekoşîneke berz di ber azadiya mirov de dike, ji lewre hezkirin û rêza xwe di nava gelê belengaz û hemû pêkhatayên Cezîrê de diçîne, di heman demê de wekî tekoşerekî kurd li herçar parçên kurdistanê tê naskirin.

Di sala 1948an de tevî Partiya Komonîst a Sûrî dibe û di heman salê de jî digel Yûsif Hersan tê girtin û dikeve zindanê. Di sala 1949an de ji zindanê derdikeve û salekê ji ber çavên hêzên ewlehiya desthilata Sûrî xwe dide alî.

Di sala 1950 de digel 83 endamên komonîst ku ew mezinê wan bûye cardin tê girtin, hêzên ewlehiyê bi tundiyeke hovane wî êşkence dikin, piştî wî rêdikin zindana Mezê li Şama paytext.

Ji ber êşkenciya hovane ya ku di zindana mezê de dibîne, Reşîdê Kurd nexweş dikeve û êşa kezêbê lê dixê.

Di sala 1967an de, ji bo dermankirinê diçe dewleta Romanyayê, lê mixabin dermankirin çarenake çiku nexweşî li tevahiya laşê wî belav dibe.

Di dawîya dîwana xwe ya bi navê (Kerwan) dedibêje;

“Pir kar û barên min hene ku ez bikim, min ew hêj nebîrîne serî. Na gerek ez niha nemirim. Gerek ez vegerim baxçeyên Dêrîkê, ku min ji mêj ve bêriya wan kiriye, paşê bila mirin were”

Di sala 1968an de koça dawî dike û li goristana Amûdê tê veşartin.



Tevahiya jiyana xwe di navbera zindan û girtûgehên Turkiyê û Sûriyê de derbas dike, û wekî lehengekî, mêrxasekî û tekoşerekî, herwiha rewşenbîr û nivîserekî kurd navê xwe di dîrokê de dikole.

Berhemên Reşîdê Kurd:

Reşîdê kurd hezkerê zimanê kurdî bûye, li kêleka guhdana wî ya bi zimanê kurdî çîrok û helbest jî nivîsîye, ji berhemê wî yên çapkirî ;

- **“Rêzimana Zimanê Kurmancî” - Çapa yekem Şam 1959an**

- **“Kerwan” dîwaneke helbestê ye piştî koça wî li Swêdê hatiye çapkirin**

- **“Konê Reş” grûpek ji helbestan di rojnameya Riya Taza de belavbûne.**

Jêder:

Enternê

Gotara Mamoste Hesên Dirêî

KARÎKATORÎST KAMÎRAN ŞEMDÎN:

**“Ez yek ji vî milletî me, êş û
nexweşiyên wî ên min in jî”**

Hevpeyvîn: Imran Yûsiv

Karîkatorîstê kurd Kamîran Şemdîn, di sala 1974an de li gundê Xirbe Dîbê yê bi ser bajarê Qamişlo ve ji dayik dibe, ew ji malbateke kurdperwer e, xwendina xwe ya seretayî li gund, ya navendî jî li bajarê Qamişloyê kuta dike, ji zaroktî ve mijûlî karê hunerê dibe, eve 20 sal in karê hunera karîkatorê dike.

-Di cîhana huner, wênekêşî û şewekariya kurdî de, hunermendên karîkatorê pir hindik in, bi dîtina we sedem çi ye û bo çi we berê xwe daye vê cureya hunerê ?

-Rast e, bi dîtina min gellek sedem hene, dibastanên vê cûreya hunerê li deverê tinebûn, li sûriyayê derfet nebû ku karîkatorist karên xwe belav bike, çinko ev hûner li ser rexneyê ava dibe, û wekî em dizanin rêjîma Sûrî rexnê qebûlnake.

Herwiha platformên kurdî an jî yên erebî li sûriyayê tune bûn da ku hûnermend bikaribe karên xwe belav bike, ji ber ku bizavên siyasî û tevgerên civakî rexne qebûlnedkirin.

Lê tevî wiha jî, hijmara karîkatorîstên kurd baş hene, û gelek ji wan li ser asta erebî navdar in.

Derbarî çima min berê xwe da vê hûnerê, bi rastî wek kesekî wênekêş min xwe di coreyên hunerê yên din de nedît, her min dixwest ew karê ku ez bikim ji raman û rengê min be.

Min gelek coreyên wênekêşiyê taqîkirin, min dît ku karîkator bi awayekî zelal û sade digihêje her kesî û her kes jî ku lê temaşe bikî têdigihêje, û ji hemiyan bêtir nêzî ramanên min bû.



-Em di tabloyên we de ciyawaziyeke diyar dibînin, ji alî xurtbûna hizir û ramanê ve, hem jî ji alî wateyê ve, ku bi baştirîn û berztrîn awa cîweriya kurdî derdiberînin, gelo ev asta bilind ji derberîne li bal we girêdayî çi ye ?

- Ez ji malbateke kurdperwer im, ji despêka damezerîna yekemîn partiya kurdî li Sûriyê ve bav, mam û birayê min

kamiran
semdin



di nava tevgera kurdî de bûn, ez di nava rewşeke wiha de mezin bûm, lewre, vê yekê gelekî bandora xwe li min û hunera min kir ku min li civata bavê xwe nerîn û xwendinên cûda cûda didîtîn.

Her dem, min rojeva siyasîya kurdî bi mijar û bûyerên wê dişopand, hem wek xwendin hem jî wek beşdarbûn. Vê yekê jî bandor li min kiriye.

her wiha, gelek tabloyên min hene, ku li ser nerîn û dîtînên dost, heval û kesên din hatine avakirin. Wan, nerîn û dîtînên xwe ji min re derdibirandin, min jî li gorî têgihiştina xwe ew nerîn dikir karekî karîkatorî.

Carinan jî ez nerînên xwe bi hevalên xwe re parvedikim û gotûbêj dikim ta

dighêjim nerîneke sade ku bibe tablo.

Ez yek ji vî miletî me, êş û nexweşiyên wî ên min in jî.

-Wêrekî û bîrwerî bingehên hunera karîkatorê ne, karîkatorîst jî gellek astengîyan di jiyana xwe de dibîne, dibe ku ji dû vî karî jî gellek serêşî û pirsgirêk li pêşiya hunermend derkevin, di derbarê wan kêşe û arîşeyên ku we di pêvajoya karê xwe de dîtine, hûn çî dikarin ji me re bibêjin ?



Ev bûye 20 sal ku ez li derveyî Sûriyê kardikim, li Se'ûdiya Erebianê me, ev bûye 9 sal ku ji ber karê min ê hûnerî nikarim serdana sûriyê bikim. Her wiha li Siûdiyê jî metrisî ji kesên tûndûtij hebû ji ber ku min gelek tablo li ser mijara terorê çêkirine. Dawîyê dewleta Seûdiyê ez û xizana min ji cihê karê min derkirin, û bû sedema ku ez niha li welatekî dijîm û malbate min li welatekî din dijî.

Her wiha, gelek astengiyên abûrî jî min dîtîn, ji ber ku karê hûnerê ne karê min yê sereke bû.

-Bi dîtina min tabloyên we ne kêmkî tabloyên hunermendê Felestînî Nacî Alelî ye, bi dîtina we, bo çî heya aniha karîkatorîstê Kurd negihiştiye asta cîhanî ?

- Spasiya te dikim ku tu min di asta Nacî Alelî de dibînî. Ew derfet bi dest ket bi taybetî ji alî ragihandin û medyaya erebî ve. Di heman demê de jî karîkatorîstên ereb di dema wî de hindik bûn, û platform ji bo wan zaf bûn .

Lê mixabin, derfet ji bo karîkatorîst li sûriyayê tinebû, û platformên kurdî jî pir kêmkî bûn.



Rewşa aborî jî bandor li min dikir, ku ez mijûlî karin din dibûm li ser hesabê karê hûnerî.

Lê di van salên dawîyê de, medyaya civakî baş belav bûye, min dikarîbû bi riya wê karên xwe belav bikim, û çend platforman nasbikim.

karên min li ser asta Sûrî û kurdî baş hatine naskirin.

Ez beşdarî çend pêşangehên sûrî û ên navdewletî jî bûme.

-Di derbarî teknîka ku hûn di tabloyên xwe de bi kar tînin de hûn çawa tabloyekê ava dikin ?

-Di despêkê de, min pênûs bi kartanî û min skan ji tabloyan çêdikir, lê ew awa pîrsgirêk di zelalbûna tabloyan de çêdikir, di dawî de ez amûrên alktronî bi kar tînim. Ku gelek hesankarîyê bo belavkirinê peydadike.

Lê bi rastî karê bi pênûsê bo min xweştir e.

-Bi dîtina we, bi çi awayî hunera karîkatorê di nav kurdan de ê geş bibe ?

-di nerîna min de, hunera karîkator di nav kurdan de dê belav bibe dema ku platformên zaf hebin, û guhdan bi hûnermendan hebe, instityot bo wan hebin. Tevger û civak rexneyê qebûl bike, bibîne ku ev hûner wek karê nivîsandinê ye.

-Di warê hunera karîkatorê de, çi projeyên we ji bo siberojê hene ?

- bi rastî niha ez û çend hevalan kardikin ji bo avakirina komcivînekê an jî wek platformekê taybet bi hunermendên karîkatora kurdî, çi kurdên sûriyayê bin ,çi jî ên kurdistanî bin, ji bo vê mijarê em digel gelek hunermendan danûstandinê dikin.

Herwiha em kar dikin ji bo derxistina kovareke kurdî taybet bi hunera karîkatorê be.

-Gotina we ya dawî ?

-Di dawîyê de, zorspas bo karê we, û spas bo xwênerên Kovara Welat. ■



FERHENGOK

alûle	الزقاق بين البيوت
arîşen	معنويات
aşêv	عملية إزالة الأعشاب الضارة
avzêl	حوض ماء-بركة
awara	مشرد
awarte	استثنائي
axpîne	رقعة من الأرض
ayînet	شريعة
azarî	عذاب
bavan	شراع السفينة
babidest	مفلس
bac	ضريبة
bêhûde	عبثا
bagemî	سفينة شراعية
bager	عاصفة
balyoz	سفير
reşbînî	تشاؤم
geşbînî	تفاؤل
bazirgan	تاجر
bazirganî	تجارة





LI SER DÎWARAN NAMEYÊN EVÎNIYÊ

Efsan Kurdî

Pîştî durişmeyên ku di destpêka şoreşa sûrî de li ser dîwaran dihatin nivîsên û piraniya wan siloganên dijî rêcîmê bûn û mijarên wan siyasî bûn.

Çanda nivîsîna li ser dîwaran heya roja îro berdewam e, lê mijara wan nivîsan hatiye guhertin .

Diyardeya nivîsên li ser dîwaran bi rengekî berfireh li bajarê Amûdê belav bûye, dema ku tu li kolanên bajêr dimeşe çavên te li nivîsên cûbicûr dikeve. Hin ji wan nivîsan pend û metelok in, hin ji wan malikên helbestan in, lê piraniya wan gotinên evînî yên sîpekan in, an jî pêkenok in .

Ne diyar e kiye yê ku li ser dîwaran dinivîse, dibe ku bêtirî kesekî be, lê tiştê diyarkirî ewe ku ev nivîs rewşa dîwaran xerab dikin, û ev diyardeyeke ne şaristanî ye.

Di derbarê vê mijarê de welatîyê ji Amûdê Kemal Xelef ji Kovara Welat re axivî û got:

Bi dîtina min, ev kesên ku li ser dîwaran dinivîsînin ne mezin in, temenê wan di binya 18 salan de ye, angê ew di qonaxa sîpekiyê de

ne, û bi van nivîsan dixwazin nameyan bighînin hizkera xwe.


Herweha di bin bandore Enternête de ev diyarde bûye rengê ji rengên lûsekerinê û di nav sîpekan de an di nava nîfşê nûhatî de belav bûye, ji ber ku ev diyarde li gelek deveran heye. Em dikarin bibêjin ku ev yek li cih hin ciwanên me bûye modêlek.

Di derbarî çareseriyê de Xelef dibêje : divê hişyarî ji hundirê malê destpêbike [ji zarokan re bê gotin ku ev karekî şaş e û nabe dîwarên bajêr bêne edemkirin.

Xwendekarekî zanîngehê ku beşê felsefê dixwîne û navê wî Siwar Ibrahîm e nerîna xwe derbarê sedemên vê diyardeyê ji kovara Welat re diyar kir û got :

Bi dîtina min Ev mijar ne cihê metirsîna ye , ew bêtir girêdayî rewşa derûnî ya xort û ciwanên me ye, li bal wan ev awayek ji awayên derberînê ye, pê êş û azariyên xwe derdiberînin, û bi vî awayî bêhîna xwe derdixînin..dibe ku aliyekî lûsekerinê jî têde hebe, sîpek gelek tiştan ji hev û du û enternête werdigirin. Dema ku ez dibêjim ti zîrar ji vî karî nayê, ev nayê wê wateyê ku ew karekî qenc e yan ez pê re me. Ez dixwazim ku navendin taybet bi ciwanan hebin ku karibin têde xwe bibînin û çalkiyan bikin û guhdanek taybet bi ciwanan hebe da ku dûrî diyardeyên çewt bikevin. ■

14





مع اقتراب موسم الحصاد... معاونة أصحاب الحصادات

نقص اليد العاملة وارتفاع أسعار قطع التبديل من المشاكل التي يعاني منها أصحاب

الحصادات

«مضيفاً وليس الغلاء فحسب فنحن نعاني من مشكلة العمال إذ لا يوجد عمال في المنطقة نتيجة الهجرة وانخفاض نسبة الشباب ويشكل ارتفاع أسعار الدولار وعدم توفر قطع التبديل للحصادات مشكلة كبيرة لأصحاب هذه الحصادات بالإضافة للرسوم الجمركية العالية التي تساهم في ارتفاع أسعارها».

كما يؤكّد خورشيد من مدينة عامودا وهو صاحب محل بيع قطع تبدال الحصادات ذلك إذ يقول في الحقيقة نحن نعلم أن أغلب أصحاب الحصادات يشتكون من ارتفاع أسعار القطع فهذا الغلاء ليس بسببنا أو أنه جشع منا .. إنما يتم تأمين تلك القطع عن طريق الإستيراد ويتم شراؤها بالدولار و الدولار في ارتفاع يومي هذا بالإضافة انه إلى حين دخول تلك البضائع إلى المنطقة نضطر لدفع مبالغ إضافية للجمارك والإيجار مما يؤدي لارتفاع أسعار تلك القطع».

يقول السيد محمد خير و هو أيضا صاحب حصادة في عامودا :

أن أجور تصليح الحصادات هذا العام مرتفعة جداً بالإضافة إلى عدم توافر اليد العاملة و تكاليف تصليح الحصادات في هذه السنة عالية جداً ولا تتوفر كل القطع اللازمة كما أن العمال يطالبون بأجور عالية سواء كانوا خياطين أو سائقين ..

رغم ذلك نحن راضون بالأجور المرتفعة لكن المشكلة الأكبر هي في توفير العمال .

يعتمد نسبة كبيرة من المواطنين في روجآفاي كردستان في دخلهم على الموسم الزراعي السنوي ، وقد يكون المصدر الوحيد لدى الأغلبية منهم الذين ينتظرون هذا الوقت من العام كي يستطيعوا تأمين دخل لهم قد يساعدهم على تحمل تكاليف الحياة طيلة بقية العام ، لكن المشاكل التي تعترضهم قد تحول دون ذلك إذا لم يتم تأمين شروط جني المحصول الزراعي التي تشكل الحصادات الوسيلة الوحيدة لذلك .

مع اقتراب موعد حصاد الموسم الزراعي لهذا العام ، يبدأ أصحاب الحصادات بصيانة وتجهيز الحصادات والآليات التي كانت متوقفة طوال فصلي الخريف و الشتاء، و يمنون أنفسهم بموسم زراعي جيد هذه السنة ، حيث يقومون باستبدال القطع القديمة بقطع جديدة، و يسعون لتأمين الأيدي العاملة لورشة الحصادة من سائقين وخياطين وعتالين و طبّاخين، استعداداً لموسم الحصاد. خاصة بعد هطولات مطرية غزيرة هذه السنة التي تعتبر الأولى من نوعها منذ عدة سنوات متجاوزة معدلها السنوي بفارق كبير و التي تبشر بموسم وفير حيث أن معظم الزراعة في روجافا هي زراعة بعليّة.

يشرف أصحاب الحصادات بأنفسهم على عمليات صيانة الحصادة نتيجة للخبرة التي اكتسبوها خلال سنوات عملهم السابقة، وتشمل عمليات الصيانة عادة فك جميع قطع الحصادة وإعادة تركيبها بعد تنظيفها وتبديل القطع التالفة.

لكن وبسبب عدم توفر قطع الغيار وارتفاع أسعارها، يكتفي البعض منهم بإجراء عمليات الصيانة الضرورية فقط و مع ذلك يواجه أصحاب الحصادات هذا الموسم كالمواسم عقبات كثيرة و من شتى النواحي تتجلى بارتفاع أسعار قطع التبديل من جهة وفقدان اليد العاملة من جهة أخرى.

يقول السيد ابراهيم خالد و هو مالك حصادة من مدينة عامودا: «نحن نعاني هذه السنة من ارتفاع أسعار قطع التبديل فهي مرتفعة جداً مقارنة مع السنوات الماضية فهناك على سبيل المثال القشّاط الذي كنا نشتره بـ ٥٠٠٠ ليرة أصبح سعره الآن ٧٠٠٠٠ ليرة سورية

أو طريقة واحدة في الكتابة، فيتنقل بين الأسطوري والواقعي، وبين اليومي والميتافيزيقي، وبين الشخصي والجماعي، بقدر ما يتنقل بين الملحمة والإنشاد الطويل حيناً، وقصيدة المشهد أو الومضة الخاطفة أحياناً أخرى.

وهذا يقودنا بالقول أن قصيدة شيركو لا تتغذى من المعرفة العقلية المباشرة ولا من العمليات الفكرية، التي تتوالد في الذهن، بل من الالتفات الذي إلى الحياة العادية والأشياء البسيطة والواضحة والقريبة من متناول القراء

هذا هو الشاعر شيركو بكس الذي كتب قبل وفاته بفترة وخلال إصابته بالمرض وصيته وهذا نصها :

« لا أريد أن أدفن في التلال والمقابر المعروفة لسببين: الأول لأنها ممثلة والثاني كوني لا أحب الزحام .

أنا أريد أن أدفن في متنزه (آزادي) إذا لم يمنع رئيس بلدية مدينتي ورئيس المجلس البلدي ، ادفن إلى جوار نصب شهداء ١٩٦٣ في السليمانية، هناك المكان أجمل ولن أصاب بضيق التنفس.

أنا ، حتى في حالة موتي أتمنى أن أكون قريباً من هؤلاء الناس، من رجال ونساء مدينتي، من صوت الموسيقى والأغاني و الدبكات ومن النوادي الجميلة لهذا المتنزه.

ليأخذوا مكتبتي ودواويني الشعرية وصوري إلى مزار.

و ليكن هناك كافتريا وجنيته صغيرة هناك، ليحل الشعراء والكتاب والشباب والصبايا العاشقات ضيوفاً عليّ.

أنا أريد أن أرى ذلك المتنزه منذ الآن بعين الخيال ، وأن أراه بعد موتي.

أريد أن أدفن ملفوفاً بعلم كردستان مع صدى ديوان (الله ويس) على مردان وأنشودة (خوايه وطن اواكه) .

أريد أن تعزف الموسيقى في مراسم عزائي وأن تعلقوا اللوحات الجميلة لفناني مدينتي في مزار.

أريد أن تستحدثوا بعد موتي، جائزة سنوية باسم (بيكه س) تمنح لأجمل ديوان شعري مختار، لذلك العام ، وأن تخصص قيمة الجائزة من ميراثي الذي سأخلفه بعد موتي. ■

حيث تظهر هذه الاحتفالية، في استثمار التواصل بين الواقع والتاريخ بتمثيل مقرون بطبقات المعنى الإنساني العميق. ويتجلى ذلك داخل خطاب الذات المبدعة وخارج حساسيته المباشرة، عبر أدوات شعرية احترافية واضحة.

جيش شيركو ييكس في تجربته الشعرية كل أشكال التعبير الشعري من الملحمة حتى قصيدة اللوحة السريعة، ومن الأسطورة حتى الغناء البسيط، ومن الغرابة السريالية حتى المشهدية السردية والحكاية. ففي قصيدته 'ضابط عادي' يقول الشاعر:

عندما منحوه نجمة واحدة

كان قد قتل نجمة

وعندما صارت نجمتين

تحولت يداه إلى حبال مشانق

وعندما صارت ثلاث نجومات

ثم تاجاً

ثم رتبة أعلى

استيقظ التاريخ في صباح ما

فوجد البلاد مملكة أرامل .

الشعر في تجربة هذا الشاعر الكبير والمتفرد هو صوت الإنسان العميق والمكبوت، وسط تاريخ طويل من الفواجع والآلام والمآسي. إنه صوت الشاعر المنحاز للحياة والحقيقة.

فالشعر عند هذا الشاعر يحاكي الرعب الوجودي، عبر ذاكرة جمعية قادرة على التعرف على الحقائق. ومما لا شك فيه، أن الإبداع فعل وجودي، يمارس نوعاً من التطهير حسب أرسطو.

من يتابع مجموعات الشاعر المتعددة منذ ' شعاع القصائد ' و 'مرايا صغيرة' و 'نغمة حجرية' و 'مضيف الفراشات' وحتى 'سفر الروائح' و 'إناء الألوان' وغيرها لابد أن يلاحظ ثراء لغة الشاعر واتساع رقعة موضوعاته وخصوبة مخيلته، قد أوصلت الشعرية الكردية إلى مرتبة الملاحم، وإلى مرتبة الأناشيد الخالدة.


فالشعر هنا يتغذى من المشهد اليومي المفعم بالمشاعر الإنسانية.. إنها عوالم شيركو ييكس التي تتحرك بكل وعي من تجربة شخصية متميزة إلى تجربة كلية إنسانية. لذلك يتجنب ما أمكنه الركون إلى نمط بعينه



شيركوه بيگس...

مسيرة حافلة بالإبداع

مروان شبيخي



الروح التواقة دوما إلى الحرية، والتحليق بعيدا خارج أجوائها الطبيعية هذا ما كان دأبه في كل حرف مارسه حباً وكتابةً وبساسة طفل كانت أغلب قصائده كعصفور تتنقل من مكان لآخر خافقاً بجناحية على أغصان الاستكشاف اللغوي في عالم الكتابة وسأحاول هنا تسليط الضوء على مسيرته الكتابية بعيدا عن تناول كتاباته الكثيرة

لقد اختار الشاعر الكردي الكبير شيركو بيگس أن ينقّب عبر لغته الأم عن شظايا التاريخ الكردي الضارب في القدم، وأن يصوغ بموهبة مرهفة وعاتية قصيدة الكرد الكبرى التي أرادها أن تكون وطناً من الاستعارات لأمة مرّقتها الجغرافيا وظلمها التاريخ وجزأتها المصالح الدولية. حيث لم يترك هذا الشاعر العظيم نامة صغيرة أو تفصيلاً بسيطاً في جغرافيا الحضور الكردي في العالم إلا وخّصّه بقصيدة أو مقطوعة أو نشيد.

شيركوه بيگس شاعر كردي ولد في مدينة السليمانية التابعة لاقليم كردستان العراق في ٢ من مايو ١٩٤٠. والده فائق بيگس وهو أحد الشعراء الكرد المشهورين ومناضل وطني وأحد قادة انتفاضة السادس من أيلول عام ١٩٣٠ حيث سجن بسببها وتم نفيه إلى جنوب العراق. كان والده أيضاً من مناصري حرية المرأة ومتأثراً بأطروحات قاسم أمين وشعر الرصافي والزهراوي وشعراء تلك الحقبة. أما الوالدة وهي في العقد الثامن من عمرها تعيش وأخته في الولايات المتحدة الأمريكية، ورث شيركوه عن أمه معرفة ومحبة اللغة الكردية من خلال الأساطير والحكايات الشعبية التي كانت ترويها له ولأخوته ومن خلال الأغاني الكردية التي كانت تغنيها لهم عند حلول الليل.

تابع دراسته المدرسية في مدينة السليمانية حيث التعليم باللغة الكردية ما عدا مادة اللغة العربي التي كانت تدرس كلغة ثانية

ورث شيركو بيگس عن والده القصيدة والشعر والنضال، وعن والدته حب اللغة الكردية، فأثت تجربته النضالية والشعرية مبكراً. فالأنظمة العراقية التي توالى على حكم العراق اشتهرت بجبروتها وقسوتها وزرعت في نفوس الناس وخاصة الشباب الخوف وانعدام الطمأنينة. وهذا ما دفع الكثير من الشبان إلى اللجوء إلى الجبل والالتحاق بفصائل المقاومة الكردية في الجبل للدفاع عن العدالة والقضية الكردية. هذا ما حصل لشيركو بيگس الذي التحق سنة ١٩٦٥ بفصائل المقاومة. وكتب في هذه البدايات الستينية قصائد لها علاقة بالمقاومة والوطنية.

وأسس احتفاليته على التجربة الحياتية بكل معاناتها وانكساراتها وأفراحها ونجاحاتها، برؤية جديدة للذات وللوطن ولغة، من خلال إحالتها إلى واقع إبداعى جديد.



HÊTÛNA BÎRANÎNAN

Ezîz Xemcivîn

*Va diçim cihê zarotiya me,
dê li wan kavilan bigerim.
Keviran hilm bikim,
hilma te ji axê bihin bikim.*

*Bi herikîna hêşiran re
hêtûna bîranînan germ bikim!
Li ber siya tûmên dildariya me bîponijim.*

*Dîlberê
awazên sawîran ji bêriya evînê difirin.
destê min bigire
sîwana xewna şiyariyê hilweşîne!*

*Va diçim warê xemgîn
ne tenê me yarê!
Awir bédengiyê diqelêşin.
Kevir, dar, kanî û newal
bi gazin dê binerin!*

*Aramiya me dengê evîn e,
rojhilata me aniya evîn e
û şeng û şêraniya me kenê evîn e!*

*Bajar dibêje ne bajar im,
sûk sar e, gul di baxê de bêzar e!*

*Va diçim û canê te bi min re dilîze.
Şêwirdar e,
bi vîna min re zîz e!
Ez ê bimînîm ta roj bipeyîve,
û asîman dengê min bibihîze!* ■

18.07.2006





مناجاة

سوسن آغا

الحنين فجرا
بتوقيت الأرق
الشوارع تغط بحزن عميق
الأرصفة تبكي مقتفيها
تنتظر بفارغ الخطوة
احتضار الخريف
عن أسطح الفصول
فتتساقط أوراقه
لتهمس في أذن الأرض
أنشودة الربيع
وتنمو براعم الحب
لتعبق برثة الحياة
وتعيد عقارب العمر
لجهات الفرحة ■



LI SER DÎWARAN NAMEYÊN EVÎNIYÊ



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Welat

ولات: مجله شهريه ثقافيه عامه

العدد (٦٠) ٢٠١٩/٣/١ م